



ԵՐՈՊԱԿԱՆ ՄԻՈՒԹՅՈՒՆԸ ՀԱՅԱՍՏԱՆԻ ՀԱՍՏ  
EUROPEAN UNION FOR ARMENIA

Human Rights Defender of RA



ՀՀ մարդու իրավունքների պաշտպան

# Rênîşadar

**Boy mafên mirova pirsên her  
demêye nû bona koronavirûsê.**





Human Rights Defender of RA



ՀՀ մարդու իրավունքների պաշտպան

## Sazkirin û parastina mafên mirovan li Ermenistanê

Welger (terçne) hatîye hazirkirinê ji komekdarîya fînansiya Evropay. Boy têkstê borcdarîyê dikşînin xebatçîyê parastina mafê mirova. Ev çî Ko hatîye nivîsandinê xweyî xwedanin. Ne eseyî wekî beranberî UN-ê û UNICEF be.

hevkar



*Empowered lives.  
Resilient nations.*



# Herdem pirsên bona koronovîrûsê

(Pê rewşa 27-ê adarê sala 2020-î)

Boy Koronovîrûsa (COVID-19) wekî gele zû belay nava mirova dibe her derê lazime pêşîya wê bigrin, bibin xweyê mafê xwe, bi zane û pisporî zanibin boy wê vîrûsê û rê lê qutkin, persîvên pirsê rast û zane bidin bajarvana, wekî boy parastina wan ew yek gelekî hewceye.

## 1. Çîye Koronovîrûs?

2019-ê salê Koronavîrûs pêjda hatîye, dem û salên derbasbûy cem mirovatîyê tûstekî usa tûnebûye. Koronavîrûs bi cûrê çilmasîyê û bîn cikandinê serê xwe radke ûsajî cem hineka bi halekî girane bedhal pêjda tê. Mîkrobê wê zû derbasî wan heval, hogira dibe kîjan bi nêzîk berbirî hevdu dibin. Emrê vîrûs li nava hewayda didebire nêzîkî 3 seheta, ser k'axaz nêzîkî 24 seheta, ser hesinê sifir 4 seheta, lê ser wan hesnê Ko jeng nabrin nêzîkî 2-3 roja ew dimînin. Ew mirovên Ko cem wan nîşanê wê vîrûsê serî bilind dike cem wan germa wan radbe, kuxik, gewrî êş, binçikî dibin... Wedê wê vîrûsê 1-14 roye. Piraniya mirova nêzîkî 80%-î qenc dibin bê komekîya doxdira. Serokê mavê hemdinîya saxlemîyê sala 2020 13-ê meha adarê bi qirarî pêjda hat û got: Wekî hela tûneye boy qenckirina Koronavîrûsê tû dû derman.

## 2. Çawa xwe biparêzin ji Koronovîrûsê?

### Ji Koronovîrûsê parastin eve.

- Pê sabûnê zû-zû destên xwe bişon, hîmlî berî nan xarinê nêzîkî 20 deqîqe. Wextê kixukê dev û pozên xwe pê destmala kaxaz bikrin wekî mîkrobê vîrûsê wirda, wêda bela nebe dev û dora û destmala kaxaz zû bavîjin.
- Nav rojêda çend çara paqîşkin eşiyay mealen xwe, fereq û derdana, hewzê serê xwe Ko dê dişon. Kinc û rehelên xwe, pêjgîrê dêmên xwe û pêjgîrên himama û rûberê nivîna bişon 60-90 bi ava kel bi derman û sabûna.
- Ew mirov kîjan cem wan tû tûstekî nexweşîyê nay eyanê be hewcê berdevkane. Tenê ew însan hewcê berdevkanin kîjan dikevîne şikê û ew însan kîjan aspêjxanada kar dikin, wekî cem wî tê eyanê çi Ko me got. Berdevk gere 3-4 sehetê carekê biguhêzin, îzin tûne dirêj ber devên wan bimîne.
- Wekî hûn gumanin ew bende nîşanê nexweşîyê cem wan hene pê gilî, gotin berdevk û lêpika xwe werke, berçevkê wekî parastî bidê ber çevên xwe mîkropê vîrûsê bi çevajî bela dibe. Wextê dikevin dikana, erebada û yêrêd mayîn 1,5-2 metra dûrî hevdu bisenin, mîkrobê nava hewayda nêzîkî 3-ê seheta serî rakirîye dimine, ser kaxaza 24 seheta, hesinên sifir 24 seheta, hesinên jeng negire 2-3 ro.

## 3. Para saxlemîya hemdinîyay bi wan qirara pêjda hatine bi çend parên zirar Ko gelekî hikmekî mezin li ser wana dike.

1) kulfetê hemle

2) mirovên 70 salî jortin

3) 70 salîyê nimztir, çawa me jorê got

- bîncikandin, kuxik, bênjandin wekî îdî cem wan bi sala heye, bi nexweşîya pişikê, astma, (COPD) Êmfizemîy yan bironxît)
- dislik êş
- gurcîk êş
- keseb êş
- bîr undakirin (sklêroz) mejîyê benda Ko xwîn rijîyan ê ser
- Şekir-dîyabêt

#### 4. Wê demê li dinîyay çî karî berdewan dîkin boy van pîrsa û tîn ser çî qîrarî?

Dewleta Êrmenîstanê 16-ê meha adarê qîrar pêjda anîn bona Koronovîrûsê hemû tûşt were kirinê û bê kirinê boy saxlemîya bajarvana.

#### 5. Kîjan mafê mirofatîyê mirova nîkarîn sînora ber wan dadin?

- Parastna mafê mirofa nîkarîn bidne dadanê çîmkî her kes hewcê wê dibe. Dixweze pîrsên xwe tem bistîne.
- Bê sûc komeka parastina hiqûqzana.
- Sûcdar wekî bikaribin şîkîyatên xwe pêjda bibin û bexşandinê bistînin.
- Qîmetkirina mirova û emîrjîyana tendirûst.
- Bîndestî û zêrandin, qedexekirin.
- Wekehevtî ber qanûnê.
- Azadî boy pîrsên zewacê.
- Mafê zaroka
- Mafê xwendinê
- Azadî boy dîn û fikra.

#### 6. Boy wê vîrûsê çî dîkin wekî sînora dadin ber wê nexweşîyê?

Here sereke ewê wekî bende bi rabûn, rûniştina xweye nêzîkî zû ji nexweşîyê hevdu digrin. Ew gere bi zanebûn û pîsporî berbirî wê pîrsêbin wekî bikaribin ewê altkin û wê tengasîyêda derkevin. Mesele bê gîlî gotin guh bidne doxdira û xwe derd û derman nekin bê gotina doxdira.

- Dûrî temama keve
- Xwe dûrî heval-hogira bigrin
- Qedexkirina çûyîn û hatinê.

#### 7. Çîye Karantîn?

Nexweşî pêjda tê ji wan mirova kîjan vîrûs cem wan îdî serî rakirîye, temîya me ji wan mirova rasthatinê çênekin tevî wan, çîqa dikirin xwe ji wan biparêzin dûrî wan kevin, tevî wan nekevin êrîş, vîrîşê, wekî wî teherî bikaribin him xwe himjî hevalên xwe dûrî wê vîrûstê bidî seknandinê. Wedê karantînay fesalbin bi desta silav û selamê nedin hevdû, saxlemîya we her yekê saxlemîya dewleta meye Êrmenîstanêye, em dixwezî zarok û meznên me bê nexweşî jîyana xwe bineşînin.

## 8. Çi tê fehmkirinê tenêkirin?

Wekî mîkrob belay her çîya nebe, vîrûs zêde nebe piranîya bajarwana werne parastinê nebin dilê nexweşîyê.

## 9. Çi tê fehmkirinê xwe tenêkirin?

Bi zanebûn û xêrxwezî dûrî heval, hogira dibe naxweze rû kes nexweş keve. Mîkrob belay mirova nebe.

## 10. Çiye mesela xwe tenêkirin û tenêkirinê?

Tenêkirin ewe wekî bi destê doxdira ew dûrî temama dixin, wekî biparêzin hevalên mayîn nexweşîyê hilnedin. Xwe tenêkirinê ewe wekî ew naxweze nexweşîyê dest bîne, xwe diparêze.

## 11. Dikarinê aza dewleta xweda bimeşim?

Navbera dewleta Ermenîstanêda îzin tûne aza herî her bajarî û her gundî, çimkî cem mejî serê xwe rakîye Koronovîrûsê û ew tirs me temamajî girtîye. Lomajî em xwe qeday dûrxin bifikirin boy saxlemîya xûşk, birae xwe, bajarwaned xwe.

- Bi destûr dikarinê derkevin
- Kîjan destûra wan heye wekî çiyê xebatê biminin
- Kîjan li sûka dikanada kirinê firotana xurekara mijûle, bazara firotana heywana, vêrnîsaja, dermanxwena, nexweşxana, ew dikarinê derkevin ser xebatê xwe.
- Rojê carekê tenê dikarinê derkevin meşê sportê.

## 12. Destê wandabe ew kaxez wekî îzna û exterîya wan hebe ew bikaribin cîkî herin çîkî din.

Eseyî destê wandabe (dakûmetên van) nav, nîşanêd wan.

## 13. Çi kaxaz lazime boy wê kaxazê?

Wekî kaxaza teye cîkî derbasî cîkî dinbî were nivîsandinê.

- ro
- nav, navê bav, femil
- kî sehetê derdkevî
- adrêsa Kuda diçî
- navê gund, şêher
- menîya çuyîna te
- kîjan sehetê tuyê vegeerî
- qulê te.

## 14. Çawa bikim wekî kaxaza çî guhastinê destê minda tûne?

Wekî kaxaza te tûne, nikarî dest bînî, tu dikarî bi destnivîsara xwe binvîsî.

## **15. Çend mirov dikarinê bi erebê herin?**

Îzin heye wê erebêda kîderê 8-a ne zêde cîyê rûniştandinêda tenê merikî cî biguhêzin.

## **16. Heye usa destûr û extîyar boy wê yekê wekî erebêda dikarî zêde mirov bibî.**

Boy zarokê biçûk ser wan be h'eseve û wan benda kîjan bi çeva mehrûmin, guhada kerin îzin heye tevî wan mirov hebe wekî wanra bibe komek.

## **17. Ez bajarwanê Ermenîstanême tême hesavê, îzna min heye ez ji dewleta xwe derê herim der?**

Rê, dirb qudkirine tû kes nikarê derkeve. Lê bi rîya aêroflotê ne qedexeye.

## **18. Kî bende dikarê bikeve dewleta Ermenîstanê?**

Boy bajarwanê Ermenîstanême rê, dirb vekiribe.

## **19. Kî dikarê bikeve dewleta Ermenîstanê wan rojana, wekî her tûşt bin kantrolaye?**

- Bajarwane Ermenîstanê
- endemên wan binelîya kîjan bajarwanê Ermenîstanê nînin.
- ew mirov wekî ne bajarwane lê îzna wî heye wekî jîyana xwe derbaske li Ermenîstanêda.
- ew bende wekî hatine mêvan li Ermenîstanê hela 14 rojên karantinê tamam nebûye hela birin.
- ew mirov kîja dewleta Ermenîstanêda dixebitin çawa bayloz, wezîr, wekîl û yêd mayin.
- ew bende kîja hatine boy tefinkirina dê, bav û qewm, pismama, ew bende usajî kîjan li Eskerê Rûssîyayda endemên wanin.
- ew erebeajo ji Corcîyay û İranêda kîjan xurek û tuştên mayîn tînin Ermenîstanêra wekî cem wan vîrûs tune.
- bi rîya hewayjî bona saxlemîya mirova dikarinê.

## **20. Ber kî rê qedaxeye wekî nikare bikeve dewleta Ermenîstanê?**

- Ew bende wekî bajarwanê Ermenîstanêye nîne, tèn ji Rûssîyay yanêji ji Corcîyayê.
- Ne bajarwanê Ermenîstanêye kîjan berî 14 rojên karantînay hatine ji cî û werêd mayin.
- Ne bajarwanê dewleta Ermenîstanê kîjan dixwezin bikevine Ermenîstanê ji weletê Koronovîrûs wir hebûye, yan hela heye.

## **21. Çawa teşkîlîkim ez xwendina xwe?**

Boy vîrûsê zangota, dibistanada ders nayne derbaskirinê. Dibistan û zango derbasî ser onlayna bûne û dûreke berdewan dikin dersên xwe, wekî ji xwendina xwe paş nemînin ne şagirtê dibistana, neji xwendewanê zanîngêhêda.

## 22. Çi dilan û civîn hatine qedaxekirin Ermenîstanêda?

Îzin tûne 20 mirova zêdetir hev tombin civînbe, dewatbe, rojbûyînbe, xulese nahêlin gelek hev bijivin.

- Dîlan, şano, sport
- Rojbûyîn, bîranîn, şîn, şayî.
- Bi gotina parêt deşkîled mayîn.

## 23. Çi qutkirin pêk tînin li cîyê başqeda.

1) Îzin tûne girtîyê li kelada xweyîkin.

- Îzin nadin tû tûstek bişînin û bistînin ji kelêda
- Rasthatin û hevdîtin tunebe Tenê bi têtê hevra xeverdin. Hev tombûne çivînê rihuanîyê.

2) kelada dikarin qedaxekin û qudkin.

- Ger
- ji wir dûrkevin wedelû
- bi gotina parêt

3) sal bi sal malên parastina zarada îznê nadin

- ji derva tû tûstek nahêlin bînin kela.
- hevdîtin tenê bi rîya têtêfonê.
- Rojên rehetbûba ofîcêra.

## 24. Çawa bistînin parastina mafê mirovayê wan peymanada.

Tû tuşt nikarê bibe qedaxe li boy parastina mafê mirovatîyê. Wekî hûn têtê derdixin, undakiriye mafê parastina mirova hûn dikarin wê qedaxekirinê bi destên hêsa durrî xwe xin. Hun dikarin xwe xwe herin yanêjî rîya nemê pirsê xwe bînin sêrî.

**Ava adrêsa**

[ombuds@ombuds.am](mailto:ombuds@ombuds.am)

yanê têlêxin 116 +37496 116100

***Mala parêta 8141***

*Ji dewletên derva dikarin têlêxin +374 11 20 81 41*

***Têl boy teşkildarya Saxlemîya +374 60 83 83 00***

*El post [info@moh.am](mailto:info@moh.am)*

***Teşkîlderê derva***

+374 60 62 00 00

*Êl post [info@mfa.am](mailto:info@mfa.am)*

***Teşkîldarê pirsê xebate 114***

*Êl post [info@misa.am](mailto:info@misa.am)*



## Kaxaza wekî Bikaribî cî werî guhastinê

\_\_\_\_\_ 2020

<b>Nav, navê bav femîl</b>	
<b>Duçî sehet</b>	
<b>Adres (ji quva diçin)</b>	
<b>Diçî Kuda adrês</b>	
<b>Menya çûyînê</b>	
<b>Kî sehetê tuyê bizvirî</b>	

Qulê te \_\_\_\_\_

